



Mucewherekî Nerûbar ê Edebîyata Kurdî ya Kurmancî: Mele Telheyê Şerefkî

Ayhan YILDIZ¹ 

Received: Apr 15, 2024

Reviewed: May 1, 2024

Accepted: May 29, 2024

Kurte

Mele Telheyê Şerefkî ku yek ji alim û edîbê edebîyata Kurdî ya Kurmancî ye, ji hêla jînenigarî, berhem û kesayetîya xwe ya edebî ve heta niha tenê di yek sempozyumekê da bûye mijara teblîxeke kurt û di gotareke akademîk da bi qasî risteyekê behsa wî hatîye kirin. Ji bilî van, tenê çend helbestên wî li ber destê çend melayên medreseyên herêmê hebûn. Wekî din agahiyên berfireh di lîteraturê da li ser wî tune bûn. Lewra me ev rewş wekî pirsgirêkeke vekolînê li qelem da û bi armanca ku em wî li gel jînenigarî, berhem û kesayetîya wî ya edebî bidin naskirin, me pirsên xwe amade kirin û em derketin qada xebatê. Di pêvajoya vekolînê da me M. T. Şerefkî rû bi rû dît, pirsên xwe jê pirsîn, dengê wî tomar kir. Ji teknîkên rêbaza vekolîna kalîtatîf, me bi rêya hevdişîna û hevpeyvînan çend caran li ser hev agahî ji wî bi xwe kom kirin. Peyra me berhemên wî yên destnivîs ji destê edîbî bi xwe bi dest xistin û ew taqî kirin. Di encama vekolînê da me tesbît kir ku ev edîbê nenas, ji salên 1960î vir ve ketîye nav seqa û atmosfera medreseyên herêma Serhed, Dîyarbekir û Batmanê, li cem miderisên navdar ên medreseyên van herêman xwendîye û îcazeya medreseyê ji destê miderisê Medreseya Cimikan Mele Mûsa wergirtîye. Wî hîn di ciwantîya xwe da dest bi nivîsîna helbestên Tirkî, Erebi û Kurmancî kirîye. Ji ber ku ew zavayê Mela Xalidê Zengokî ye û wî bi malbatî ji berhemên wî yên dîni yên Kurdîya Kurmancî sûd û mifa wergirtîye, ew ji hêla edebîyata dîni ve ketîye bin bandora wî; îca ji ber ku di medreseyên curbicur ên herêma Serhed, Dîyarbekir û Batmanê da xwendîye, bi refleks û helwesta helbestên Mele Şêxmûs (Cegerxwîn) û Mele Ebdurrehemanê Mûşî (Durre) dest bi hûnandina helbestên Kurmancî kirîye. Şerefkî mewlûdeke menzûm, du diwan, otobîyografîyeke menzûm û biyografîyeke pexşan bi Kurmancî nivîsîye; çend helbest jî bi zimanê Erebi û Tirkî nivîsîne. Heta niha ji van berhemên wî yek jî nehatîye çapkirin û vekolerên edebîyata Kurmancî pê haydar nebûne. Herçendî piraniya helbestên diwanên wî wekî tema li ser gelperwerîyê bin jî, gelek helbestên wî li ser nixên dîni yên Îslamî jî hene.

Bêjeyên Sereke: Edebîyata Kurdî, Mele Telheyê Şerefkî, Berhemên Şerefkî, Kesayetîya Edebî ya Şerefkî

Recommended citation:

Yıldız, A. (2024). Mucewherekî Nerûbar ê Edebîyata Kurdî ya Kurmancî: Mele Telheyê Şerefkî. *International Journal of Kurdish Studies* 10 (2), 283-313, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1468825>

¹ Ph.D., Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye: ayhanyildiz@artuklu.edu.tr
ORCID: <https://orcid.org/0000-0002-8763-4182>

A Jewel of Kurmanji Literature of Out of Sight Kurdish from the Eye: Mele Telheyê Şerefkî

Abstract

Mele Telheyê Şerefkî, one of the scholars of Kurmanji Kurdish literature, has so far been the subject of only one symposium paper and mentioned in one sentence in an academic article with his life story, works and literary personality. Apart from these, only a few of his poems were in the possession of Diyarbakır madrasah teachers. Apart from this, there was no extensive information about him in the literature. Therefore, we identified this situation as a research problem and prepared our questions in order to introduce him together with his life story, his works and his literary personality and started the study field. During the research process, we saw Şerefkî, met him face to face, asked him our questions and recorded his voice. We collected information several times through face-to-face interviews, one of the qualitative research techniques. Then we obtained his manuscript works and analysed them. As a result of the research, we found out that this scholar was educated in the 1960s in the madrasas of famous madrasas in the Serhat, Diyarbakır and Batman regions, and finally received his madrasah icazet from Mele Mûsa, the scholar of Diyarbakır Cimikan Madrasah. He started to write poems in Turkish, Arabic and Kurdish/Kurmanji from his early youth. Since he was the son-in-law of Şêx Xalidê Zengokî and his family benefited from his religious-literary works in Kurmanji, he was influenced by him in terms of religious literature. However, as he studied in various madrasas in the region of Serhat, Diyarbakır and Batman, he began to write Kurmanji poetry under the influence of Mele Şêxmûs (Cegexwîn) and Mele Ebdurrehmanê Muşî (Durre). Şerefkî wrote a poetic mawlid, two divans, a poetic biography and a prose biography in Kurmanji, as well as several poems in Arabic and Turkish. Until now, none of these works have been published and researchers of Kurmanji literature have not been aware of him. Although the theme of his poems is usually national sentiments, there are also many poems that deal with the values of Islam.

Keywords: Kurdish literature, Mele Telheyê Şerefkî, Şerefkî's works, Şerefkî's literary personality

Gözden Irak Kürtçenin Kurmanci Edebiyatının Bir Mücevheri: Mele Telheyê Şerefkî**Öz**

Kürtçenin Kurmanci edebiyatının edip alimlerinden biri olan Mele Telheyê Şerefkî, yaşam öyküsü, eserleri ve edebi kişiliğiyle şimdiye kadar sadece bir sempozyum bildirisine konu olmuş, akademik bir makalede de bir cümlede bahsi geçmiştir. Bunların dışında sadece birkaç şiiri Diyarbakır medrese hocalarının elinde bulunuyordu. Bunun dışında onun hakkında alanyazında geniş bir bilgi bulunmuyordu. Dolayısıyla biz de bu durumu bir araştırma sorunu olarak belirledik ve onu, yaşam öyküsü, eserleri ve edebi kişiliğiyle birlikte tanıtmak amacıyla sorularımızı hazırladık ve çalışma sahasına başladık. Araştırma sürecinde Şerefki'yi gördük, onunla yüzyüze görüştük, ona sorularımızı sorduk ve sesini kaydettik. Nitel araştırma tekniklerinden yüzyüze görüşme yoluyla birkaç kez bilgi topladık. Daha sonra onun yanında bulunan elyazması eserlerini elde ettik ve onları inceledik. Araştırma sonucunda bu edip alimin 1960'lı yıllardan itibaren Serhat, Diyarbakır ve Batman bölgesinde ünlü müderrislerin medreselerinde eğitim gödüğünü, nihayetinde Diyarbakır Cimikan Medresesi alimi Mele Mûsa'dan medrese icazetini aldığını tespit ettik. O, daha ilk gençlik yıllarından itibaren Türkçe, Arapça ve Kürtçe/Kurmanci şiirler yazmaya başlamıştır. Kendisi Şêx Xalidê Zengokî'nin damadı olduğundan ve ailece onun dini-edebi olan Kurmanci eserlerinden faydalandığından, dini edebiyat açısından onun etkisine girmiştir. Ancak Serhat, Diyarbakır ve Batman bölgesinin çeşitli medreselerinde okuduğundan, Mele Şêxmus (Cegexwîn) ve Mele Ebdurrehmanê Muşî (Durre) etkisiyle Kurmanci şiir yazmaya başlamıştır. Şerefkî, manzum bir mevlit, iki divan, bir manzum özyaşam öyküsü ve bir mensur yaşam öyküsünü Kurmanci olarak yazmanın yanı sıra Arapça ve Türkçe olarak da birkaç şiir yazmıştır. Şimdiye kadar bu eserlerinden hiçbiri yayımlanmamıştır ve Kurmanci edebiyatı araştırmacılarının ondan haberi olmamıştır. Şiirlerinin teması genellikle milli duygular olsa da İslam dininin değerlerini işleyen birçok şiiri de bulunmaktadır.

Anahtar Sözcükler: Kürt edebiyatı, Mele Telheyê Şerefkî, Şerefkî'nin eserleri, Şerefkî'nin edebi kişiliği

Destpêk

Mele Telheyê Şerefkî, bi tevî ku xwedî hin berhemên edebî yên Kurdi/Kurmancî ye, mîna gelek alim û edîbên nenaskirî, wî jî hîn di pirtûkên dîrokî yên edebîyata Kurmancî da cihê xwe negirtîye. Rojekê helbesteke wî bi destê me ket. Peyra me da ser şopa wî û em bi ser hemû berhemên wî ve bûn. Me dît ku wî du dîwan, otobîyografiyeke menzûm, bîyografiyeke mensûr û mesnewîyeke mewlûdê bi Kurmancî hûnaye. Gava me ev berhem dîtîn, di qada lîteratura edebîyata klasîk a Kurmancî da me geryanek kir; bes me dît ku tenê yek xebateke li ser wî û berhemên wî hatîye amadekirin; lêbelê xebateke akademîk li ser bîyografi, perwerde, kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî, vekolîneke zanistî ya dorfireh nehatîye amadekirin. Bi ser de jî ev berhemên wî gişt hîn jî li ser rûpelên defteran in û nehatine çapkirin. Ji ber vê yekê, çawa ku em çav bi wan ketin, demildest me pêdivî dît ku em berhem û bîyografiya wî bikin mijara xebateke serbixwe. Lewra me bîyografi, kesayetîya edebî û berhemên M. T. Şerefkî ji bo vê xebatê, wekî pirsgirêka vekolîne wiha dîyar kir:

“Gelo Mele Telheyê Şerefkî bi tevî bîyografi, kesayetîya edebî û berhemên xwe, di dîroka edebîyata Kurmancî da xwedî reng û rûyekî çawa ye?”

Di pey dîyarkirina pirsgirêka vekolîne da, me hewl da ku vê pirsgirêkê çareser bikin û bersiva van pirsan bidin: Mele Telheyê Şerefkî kî ye, li kê derê, di kîjan medreseyan da li ber kîjan miderisan çî tehsîl dîtîye? Çî berhemên wî neçapkirî û neçapkiri hene? Têkildarîya wî ya bi tesewufê ra di çî astê de ye? Gelo ev edîb bi reng û şewaza xwe ya edebî-hunerî, dikeve bin banê kîjan nerîta edebî û tradîsyona dîrokî ya edebîyata Kurmancî?

Bi mebesta ku em di nav qonaxên dîrokî yên edebîyata Kurmancî da cihê vî edîbî destnîşan bikin, me ev xebat hilbijart û kir mijara vekolîna xwe. Gava di vê xebatê da em bigihîjin armanca xwe, bivê nevē agadarîyên pêwîst ên tîkildarî vî edîbê nenaskirî dê ji berzebûnê xelas bibin û edîbekî din ê giring jî, bi reng û rûyê xwe yê xweser dê li dîroka edebîyata Kurmancî zêde bibe. Çinku xelekên dîrokî yên edebîyatekê, bi naskirina edîbên wê edebîyatê û berhemên wan ronahî dibin. Gava edîbên sedsalekê gişt, li gel berhemên xwe bihên naskirin, helbet zîhnîyet û nerîta edebî ya serdemekê jî pê ra dihê naskirin. Vekolînerên dîroka edebîyata wî gelî jî, dikarin hîn tekûztir nerîtên edebî yên wê edebîyatê binirxînin. Îca gava ev derfetên navbihurî li ber destê wan tune bin, bivê nevē dîroknasên wê edebîyatê nikarin bi zelalî û bi awayekî zanistî serdemên dîrokî yên wê edebîyatê li gel teybetmendîyên wê kategorîze bikin. Di vê rewşê da nirxandina dîroka wê edebîyatê jî kêr

û kurt dimîne. Bi saya vê xebatê vekolînerên ku li ser nerît û qonaxên dîrokî yên edebîyata Kurmancî dixebitin, dê nîrxandinên hîn çêtir bikin. Ji ber vî awayî qenaeta me ew e ku ev vekolîn gelek giring û sûdewar e.

Li ser vê binbarî û berpirsîyarîyê me berê xwe da qada xebatê û li gor derfetên xwe dest bi vekolînê kir. Me dît ku li gel derfetên dem, hez û behremendîyê, derfetên me yên taqetî û maddî jî têra vê mijarê dikin ku em vê vekolînê bibin serî û bi serfirazî ji binê wê rabin. Li ser vê bingehe me demildest dest bi berhevkirina daneyan kir.

Serê ewil em li agadarîyên nivîskî yên têkildarî Mele Telheyê Şerefkî gerîyan; me dît ku Recep Aslan (2012) di teblîxa xwe ya “Molla Hâlid Zengokî ve İlmî Kişiliği” (Aslan, 2012, s. 740) da cih daye hin agahîyên kurt têkildarî Mela Telhe Yiğit; bes wî behsa bîyografî û berhemên serekî nekiriye. Edibe Aslan (2023) di teblîxa xwe ya bi navê “Talha Yiğit” (Aslan E. , 2023, s. 279-280) da hinek agahîyên kurt ên têkildarî jînenigarîya Mele Telhe dane û piştî ku wê navê berhemên wî dane, dor anîye ser xizmetên wî yên medreseyan û mijar bi dawî kirîye. Wê tu berhemeke vî edîbî nedaye nasandin û qala kesayetîya wî ya edebî nekiriye. Di vê rewşê da me tê derxist ku valahîyek di vê mijarê da heye û heger bihê dagirtin, dê ji bo raborî û dahatîya edebîyata Kurdî ya Kurmancî bi kêr bihê. Lewra me vekolîneke di vê biwarê da pêwîst dêra.

Di pey xwendin û nîrxandina lîteratura nivîskî ya têkildarî Şerefkî da, ji bo xebata qadî/sehayî, me pirsên xwe yên ji bo hevdişîn û hevpeyvînê amade kirin û berê xwe da sehaya xebatê. Piştî hewldanekê, me peywendî li gel edîbî bi xwe danî. Bi rêya hevdişîn û hevpeyvînê xwe yên carbareyî, pirsên xwe yên ku di çarçoveya mijara xwe de amade kiribûn, çend rojan li ser hev jê pirsîn, dengên wî qeydî cîhazê kir û di wextê rêzkirina daneyan da ji deşîfrasyona wan sûd wergirt. Herwiha me destnivîsên wî bi destûra wî jê wergirtin û li gor agahdarîyên ku me ji devê wî bi xwe wergirtin û ji berhemên wî îstîfade kir, me binemal, bîyografî, ramyarîya wî, têkilîya wî ya bi tesewwufê re, keseyatîya wî ya edebî û taybetmendîyên berhemên wî rapor kirin. Peyra me rapora xwe ya nivîskî, ji serî heta binî li rûyê wî xwend û kem û kurtîyên xwe sererast kirin. Di pey berhevkirina daneyan û raporkirina wan da dor hat ser tesbîtkirina cihê wî di dîroka edebîyata Kurmancî da. Piştî ku me analîza vedîtin û şiroveya daneyên xwe kirin, êdî me encama xwe dîyar kir.

1. Bîyografiya Mele Telheyê Şerefkî

1.1. Binemala Wî

Binemala Mele Telhe bi eslê xwe ji eşîra Badikan e. Diwazde qebîleyên vê eşîrê hene. (Güneş, 2023, s. 2) Bav û kalên M. T. Şerefkî ji qebîleya Şerefkan e. Di nav pêşîyên vê qebîleyê de şêx, seyîd û alim hene. Mele Telhe, kurê Hecî Ebdulhelîm e, ew kurê Hecî Salih e, ew kurê Mihemed Xan e, ew kurê Mistefa ye, ew kurê Huseyn e, Huseyn kurê Şemseddîn e, Şemseddîn kurê Mele Omer e. Kalê wî 150 sal berê ji qezaya Pasûrê/Qulpê, ji gundê Şerefka², hatîye gundê Mûşê Newala Milkê (Güdümlü). Li wê derê wan bi Ermenîstanê ra cîrantî kirine. Piştî ku şênîyên Ermenî ji wê derê derketine, ew jî kişîyane gundê deştê Kurdmeydanîyê. A niha di gundê Kurdmeydanîyê³ da disekin. Li gorî usûla şer'î ya Îslamî, heqqê wan ê av û axê li Hezrazê ye. Erdê ku a niha ew li serê ne, ê xelkê ye û hatîye standin. Milkê wan li zozanê Özme Dağı heye, li alîyê Qulpê jî Hezra û Şerefka (Ünal) heye. Kalê Mele Telheyî piştî Herba Ewil a Cîhanê ji gundê Milkê derbasî Kurdmeydanîyê (Eralan) bûye.⁴

1.2. Jîyan û Tehsîla Wî

Mele Telheyê Şerefkî li Kurdmeydanîyê (tr. Eralan) di sala 1950 de hatîye dinyayê. Kalê wi Hecî Salih, ji ber hin tiştan aciz bûye hatîye Farqînê (Silvan) gundê Fêra ku li ser çem e, sê salan bi malbatî li wê derê mane. Peyra wan mala xwe bar kirîye anîye navenda Farqînê û ew li Taxa Ferîdon salekê mane. Ji wê derê careke din wan mala xwe anîye Kurdmeydanîyê. Li vî gundî Zîyareta Kalê Melhesen heye, wan mala xwe ji bo xatirê wê zîyaretê anîye vî gundî.

M. T. Şerefkî pêşî hinekî li cem seydayê xwe Mele Yasînê Aqîka⁵, di sala 1958an da di nav feqîyan da li Kurdmeydanîyê xwendîye. Şênîyên Aqîka⁶ jî bi eslê xwe Badikî ne. Zemanê ku Mele Yasîn diçe Qizilxaçê, Mele Telhe jî pê ra çûye xwendinê. Di sala 1960î da Mele Telhe di zarokatîya xwe da nexweş ketîye, bavê wî ew birîye Îsparta Eğridir Kemik

² Navê fermî yê gundê Şerefka “Ünal” e û ji hêla sîyasî ve li ser navçeya Pasûr/Kulpê ye. (Dikarî bnr. <https://pasurilcesi.blogspot.com/2009/03/pasur-ilcesi-koyleri.html>, (Tarîxa hevdîtînê: 19.05.2024).

³ Navê fermî yê gund Kurdmeydanîyê “Eralan” e. (Hevpeyvîna li gel Mele Telhe)

⁴ Hevpeyvîna taybet li gel Mele Telhe, li Gazîlera Kayapinarê, li mala vekolerê vê xebatê, (Tarîxa hevdîtînê: 06.03.2023).

⁵ **Mele Yasînê Aqîka**, bi eslê xwe ji hoza Aqîkan a êla Badikan e. Ew jî zavayê Şêx Xalidê Zengokî ye. Aqîkan (Tr. Yakut), li ser Qulpê ye û nêzî gundê Duderyayê ye. (Notên li gel Mele Telhe).

⁶ Aqîka (Tr. Yakut), hem navê gundekî Qulpê ye hem jî navê hozeke êla Badikan e. Ev gund nêzî gundê Duderyayê ye.

Hastanesi [Nexweşxaneyê Hestîyan]. Li wê derê sê mehan tedawî dîtîye. Piştî ku baş dibe, vedigere Mûşê, dihê malê. Wê hingê Mele Telhe 11-12 salî ye. Li malê jî 2 salan di nav cih û nivînan da dimêne. Çawa ku dihê ser hemdê xwe, bavî wî jê ra dibêje: “Tu dê bixwînî. Xwendin li te; mesref li min. Lêbelê yardim, zikat, îsqat û tiştên ku feqî kom dikin, ji te ra heram e, tu nastînî. Bi malê xelkê mexwêne, bi malê min bixwêne.” M. T. Şerefkî ji wê derê diçe herêma Farqînê, li Kovîtê, li cem Seyda Mele Remezanê Aqîkî çendakî dixwêne, peyra di sala 1962an da diçe gundê Pelkê⁷ nava Bekiran,⁸ li wê derê li ba Seyda Mele Fethullah⁹ dixwêne. Di zemanê wan da nêzî 10 feqîyên wan hebûne, Mele Elîyê Berdaxan ê Dîyarbekirî talibê medreseya Seyda Mele Fethullah bûye. Wê hingê Seyda Mele Yehya¹⁰ li Şelmo¹¹ bûye, Şêx Ebdulhekîmê Qesrikê¹² ku a niha li Menzîla Semsûrê (Adiyaman) ye, ji Qesrikê¹³ hatibû Xedîrê.¹⁴ Mele Telhe di sala 1963yan de li wê derê çendakî dixwêne. Piştra

⁷ Navê fermî yê gundê Pelkê Yapraklı ye. Nêzî Kanîyahenê (Bekirhan) ye. Gundê vekolerê vê xebatê nêzî vî gundî ye. Ev gundekî Hezo (Kozluk) ya Batmanê ye.

⁸ Bekiran, navê eşîrekê ye ku li herêma Xerzan nêzî 7 gundên wan hene.

⁹ **Mele Fethullah**, li gundê Şelmo (Ulaşlı) ku li ser Hezoya (Kozluk) Batmanê ye, di sala 1938an da hatîye dinyayê. Navê wî yê fermî Fethullah Bakış e. Pêşiyên wan ji herêma Botan, ji Cizîrê hatine Şelmoyê. Neseba wan digihîje Hz. Ebbas ku mamê Hz. Pêxember e. Lewra ji binemala wan ra Ebbasî dibêjin. Kalê wî Mela Muhyeddîn di sedsala 19an da hatîye Dergahê Şêx Muhammedê Zilî (gundê Zîla-Yeniçağlar) û di medreseya wî da mideristî kirîye. Mela Fethullah birayê Seydayê Hecî Pîran (Şelmo/Ulaşlı) e. Peyra wî mala xwe anîye Kanîyahenê (Bekirhan). Kanîyahenê jî li ser Hezo (Kozluk) ya Batmanê ye. Mele Fethullah helbestek bi zimanê Kurdî nivîsiye. Cureyê wê mersîye ye ku wî li ser wefata şêxê xwe nivîsiye. (Me ev malûmat ji Mamoste Eşrefê Mela Fethullah û Mele Ebdulletîf ku biraziyê Mele Fethullah e wergirtin. 26.05.2024, li Batmanê di Medreseya wan da)

¹⁰ **Mele Yehya**, sala 1940î li Şelmoya Hezo ya Batmanê hatîye dinyayê. Navê wî yê tam Şêx Yehya el-Ebbasî ye. Navê bavê wî Mele Ebdurrehmanê kurê Mele Ahmedê kurê Mela Muhyeddînê kurê Mela Îbrahîm e. Bi eslê xwe digihîjin mamê Hz. Pêxember Hz. Ebbas. Mele Yehya pêşî li cem bavê xwe xwendîye, peyra li cem Xewse Bilwanîsî (Qesrewî) Şêx Seyyîd Ebdulhekîm el-Huseynî xwendîye, di sala 1957an da îcaze ji destê wî girtîye û li wê derê dest bi mideristîyê kirîye. Piştî ku Şêx Ebdulhekîm rehmet kirîye, wî întisabî lawê wî Şêx Mihemed Reşîd kirîye. Mele Yehya piştî ku li çend cihan îmamî kirîye, sala 1987an malnişin bûye. Li ser talîmata şêxê xwe, wî li Stenbolê dest bi kar û barên îrşadê kirîye. (Bnr. Şeyh Yahya el-Ebbasî, *Sohbet-i Gulşeni*, (Derleyen: Serdar Üstündağ), Sistem Matbaacılık, İstanbul, 2007, r. 9-10.) Mele Yehya du helbest bi zimanê Kurdî nivîsiye. Yek jê mersîye ye ku wî li ser wefata şêxê xwe nivîsiye. (Hewpeyvîna li gel Mele Ebdulletîf Bakış, 25.05.2024)

¹¹ Navê fermî yê gundê Şelmo, Ulaşlı ye. Nêzî Kanîyahenê (Bekirhan) ye. Qeyda nifûsê ya vekolerê vê xebatê li ser vî gundî ye. Ev gundekî Hezo (Kozluk) ya Batmanê ye.

¹² **Şêx Ebdulhekîm**, kurê Şêx Muhammedê Xalidî ye. Şêx Ebdulhekîm, ji ber ku çendakî li gundê Sîyanîs ê Baykana Sêrtê jîyaye, bi navê Şêx Ebdulhekîmê Huseynî yê Bilwanîs dihê binavkirin. Ew xelîfeyê Şêx Ehmedê Xiznayê ye ku şêxekî Xalidî yê Sûriyeyê ye. Wî piştî ku çend salakî li gundên Sêrt û Bidlîsê şêxîti kir, derbasî gundê Menzîla Kahtaya Adiyamanê bûye. (Bnr. <https://islamansiklopedisi.org.tr/erol-muhammed-rasid>, (Tarîxa xwepêgihandinê: 20.05.2024, 10:07).

¹³ Şêx Ebdulhekîm wextakî li Qesrikê di medreseya xwe da mideristî kirîye. Şêx Ebdulhekîm wextakî li Binxetê di medreseyên Kurdan da xwendîye. Qesrik ku nêzî Hawêl (Baykan) e, îro bi navê xwe yê fermî Narlıdere ye.

¹⁴ Navê fermî yê gundê Xedîrê “Karaoğlak” e. Ev gundekî Hezo (Kozluk) ya Batmanê ye. (Bnr. Mehmet Sadık Varlı, *Bi Dîtin û Şahidîya Min Ebdullah M. Varlı*, Nûbihar, İstanbul, 2023, r. 57.)

ji wê derê diçe Medreseya Mele Hiseynê Kuçuk¹⁵, ba Mele Hadî¹⁶ û Mele Mehdî.¹⁷ Çendakî bi şûn de vedigere Ferhendê¹⁸, hinekî li wê derê dixwêne û peyra vedigere Mûşê. Ji wê derê jî diçe Aşqaleya Agirîyê¹⁹, ba Seydayê Mele Mistefa.²⁰ Debara xwendinê û derfetên li wir, wê hingê zêde zehmet bûne, ji wê derê careke din vedigere Ferhendê. (Navê fermî yê Ferhendê Kayadere ye (Ağcakaya, 2021, s. 1). Li wê derê li ber destê Mele Ebdussemedê kurê Mele Yehya xwendina xwe berdewam dike.²¹

Mele Telhe li ba Mele Îbrahîmê Belê²² çendakî dixwêne, peyra diçe bajarê Mûşê, gundê Artxûngê (Tr. Ortakent), li wê derê Mele Ebdulhekîmê Kose²³ ku zavayê Şêx Badînê Duderyaya Qulpê²⁴ ye ders didê. Ku Mele Ebdulhekîmê Kose ji Artxûngê²⁵ diçe gundê Seqawîyê,²⁶ Mele Telhe jî li pey wî diçe wê derê û tehsîla xwe berdewam dike. Di pey çendakî da ew berê xwe dide gundê Reşîkê, cem Seydayê Şêx Seyîd li alî Farqînê. Çendakî li wê derê dixwêne û di meha Remezanê de dest bi meletîya fexrî dike. Peyra eskerîya wî

¹⁵ **Mela Hüseyn Küçük**, di sala 1871ê da li Deştadelê ku nêzî Cizîrê ye hatîye dinyayê. Wî di medreseyên Kurdan da tehsîla îlim dîtîye û piştî ku îcaze girtîye, hatîye li Farqînê bi cih bûye. Mala Ezîzan jê ra li Farqînê mizgeftêk û medresyek ava kirîye û wî jî karê mideristîyê kirîye. Mela Huseyn di sala 1955an da wefat kirîye û li Farqînê di Goristana Şêx Xelîl de medfûn e. (Mehmet Çiçek, “Seyda Molla Hüseyn Küçük’ün Hayatı ve İlmi Kişiliği”, *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, j. II, 2009, r. 124-127.)

¹⁶ Mele Hadî kurê Mele Huseynê Kuçuk e.

¹⁷ Mele Mehdî kurê Mele Huseynê Kuçuk e.

¹⁸ Ferhendê, bi navê xwe yê fermî Kayadere, gundekî Farqînê ye.

¹⁹ Navê fermî yê Aşqale, Aşkale ye û bi ser navenda Agirîyê ve hatîye berdan. (Dikarî bnr. <https://redkani.blogspot.com/2017/06/asqale-askale.html>, (Tarîxa xwepêgihandinê: 19.05.2024, 21:59).

²⁰ **Mele Mistefa** bi eslê xwe ji Agirîyê ye. Di wextê xwe da alimekî navdar bûye. Di salên 1964an da medreseya wî li Aşqalayê hebûye û wî ders dane feqîyan. Mele Mistefa ji eşîra Sîpikan e û digihîje Ebdulmecîdê Sîpîkî. Pêşîyên wan ji Iraqê hatine Dutaxê. Wî heta 100 salîya xwe ders dane. Wî ji edebîyatê zêdetir ji bo sulhên civakî kar dikir. (Notên li gel Mele Telhe).

²¹ **Mele Yehyayê Ferhendî**, di sala 1859an da li gundê Ferhendê hatîye dinyayê. Ferhendê gundekî Farqînê (Silvan) ye. Ew bi eslê xwe ji eşîra Xîyan gundê Malamelkê ye. Mele Yehya, çendakî li Mûşê di Medreseya Mele Teyîb da xwendîye. Wî îcazeyek jî Şêx Umerê Heşamî, yek jî jî Şêx Seîdê Bellê girtîye. (M. Êhsan Hêvîdar, “Seydayê Mela Yehyayê Ferhendî”, *Nûbihar*, 2008, j. 104, r. 48-52.)

²² **Mele Îbrahîmê Belê**, ji gundê Belê ye, ev gund li ser Farqînê ye. (Notên li gel Mele Telhe).

²³ **Mele Ebdulhekîmê Kose (Seyret)**, bi eslê xwe ji hoza Kerra ya êla Badikan e. Ew birazîyê Şêx Xalidê Zengokî ye. Ew di îlmê şerîet û edebîyatê da gelek zana bûye. Hin berhemên wî yên menzûm ên bi zimanê Erebi û Kurdî hebûne. Wî di sala 1997an da wefat kirîye, li Artxûngê (Ortakent) medfûn e. (Notên li gel Mele Telhe).

²⁴ **Şêx Badînê Duderya (EREN)**, şêxê tekya û medreseya Duderyaya Qulpê ye. Ew kurê Şêx Muhemed Emînê Duderî ye ku zemanekî muftîyê Qulpê bûye. Şêx Badîn di sala 1915an da li li gundê Duderyayê hatîye dinyayê. Wî di Medreseya Duderyayê de xwendîye û îlmê xwe xelas kirîye. Dewletê ew di sala 1937an da bi sirgûnî ajotîye bajarê Aydinê û heta sala 1947an li wê derê mane. (Taki Eren, “Şeyh Bahaddin”, <https://www.duderyadiyari.com/Makale/93/16>, (Tarîxa hevdîtîne: 19.05.2024, 22:21).

²⁵ Navê fermî yê gundê Artxûnê Ortakent ye. Gundekî Dešta Mûşê ye. (Notên ji devê M. T. Şerefkî)

²⁶ Navê fermî yê gundê Seqawîyê Mercimekkale ye. Nêzî navenda Mûşê ye. (Notên ji devê M. T. Şerefkî)

dihê, ji ber nexweşîna xwe ji eskerîyê mîaf dibe. Şerefkî di sala 1967an da gundê Axfirîs²⁷ û li cem Mele Sidîq²⁸ bi qasî sê mehan dersa zimanê Farisî dixwêne, ji wê derê jî diçe gundê Warqilîs²⁹ li cem Mele Ebdulkerîm dixwêne.

Mele Telhe careke din tê ba Seydayê Mele Mûsa gundê Cimika³⁰ ku ev gund li ser rêya Erxenîyê ye. Mele Telhe di sala 1967an da li Cimikan (Çakmak Köyü), li cem Mele Mûsa³¹ dixwêne û îcazeyaya xwe jê werdigire. Seydayê Mele Mûsa wê hingê sedsalî bûye û hîn di medreseya xwe ya nefermî da mideristî dikir. Mele Telhe piştra ji wê derê diçe gundekî Deşta Mûşê, nêzî gundê Kurdmeydanîyê ye dest bi meletîya fexrî dike. Li wê derê ji bo bikaribe bi awayê fermî wezîfeya meletîyê bike, dikeve azmûnên îmam xetîbîyê. Serê ewil “Gece Belgesi” digire, peyra dîplomeya îlkokulê (Bawernameya Dibistana Seretayî) ji derve ve li Solaxanê (tr. Solhan) digire û dest bi lîseyaya îmam xetîbê dike. Piştî ku dîplomeya wê jî digire, îca belgeya îmamîyê fermî û belgeya Kur’an Kursu jî werdigire. Bi vî awayî deh belge ji derve ve digire û dibe îmamê fermî.

Mele Telhe di sala 1966an de bi keça Şêx Xalidê Zengokî ra zewicîye. Şêx Xalid³² alimekî mezin e û ji ber ku wê hingê sê caran bi peyatî çûbûye hecê, xelkê navê “Hecî Xalidê Zengokî” lê danîye. Ji ber ku wê hingê çûn û hatina hecê zêde zehmet bûye, qedrê hecê ji yê şexantî û meletîyê zêdetir bûye. Şêx Xalid xezûrê Mele Telhe ye. Bavê Mele Telhe bi xwe jî telebeyê Şêx Xalid e û Şêx Xalid keça xwe daye Telheyê 17 salî.

²⁷ Axfirîs gundekî Norşêna Hezret (Gürpınar) e û li ser bajarê Bidlîsê ye.

²⁸ Mele Sidîq di zemanê xwe da alimekî navdar bûye, ji ber ku rehmet kirîye, li ser wî agadarî bi dest neketin.

²⁹ Warqilîs gundekî Mûşê ye û navê wî yê fermî Altunova ye.

³⁰ Navê fermî yê gundê Cimika “Çakmak” e. (Dikarî bnr. <https://www.google.com/maps/dir/38.1564969,39.9525739/@38.192864,39.7735905,10.96z?entry=ttu>)

³¹ **Mela Mûsa**, bi eslê xwe ji êla Badikan e û ji hoza Şerefkan e. Cimika, navê bavistîneke êla Badikan e. Zemanekî ev hoza Badikan hatîye vî gundî ava kirîye. Hîn jî xelkê vê eşîrê li vî gundî hene. Mele Mûsa, ji Şêx Mahmûd xelîfetî girtîye lêbelê tenê bi karê dersadayînê ra mijûl bûye. Bi tevî ku temenê wî gihaştîye sedsalîyê jî wî di medreseya xwe da ders daye. Jixwe ew hevdemê Şêx Seîdê Paloyî bûye. Kurekî wî yê bi navê Mele Mistefa li Dîyarbekirê hebûye. Seydayê Mele Salih Tanrikulu miftîyê Mûş û Dîyarbekir tevî Mele Ebdulqudûs Bozkurt Cimikî miftîyê Erxenî û Silivân bûye, Mele Cemîlê Badikî Aqikî jî miftîyê Kozlîx bûye, van her sê aliman ji ba Mele Mûsa îzîn stendibûn mezûnê medreseya wî bûn. (Notên ji devê Mele telhe).

³² Şêx Xalid hevdemê Şêx Seîdê Paloyî ye. Zemanê ku Xalid Begê Cibrî bi tevî Seyîd ‘Elî li Bilîsê xeniqandine û Şêx Seîd bi tevî hevalên wî Dîyarbekirê darda kirine, wan Seydayê Şêx Xalid bi tevî hevalên wî birîye Xarpêtê. Li wê derê hakimî hinek ji wan kesên ku birine Xarpêtê mîna yê Dîyarbekir û Bilîsê nexeniqandine û piştî çendakî ew vegeeriyane malê. Deh berhemên wî yê li ser fiqih û ‘eqîdeyê hene û mewzûn in. Şêx Xalid di sala 1967an de pîrekên xwe azad dike, nifqa wan dide wan û dibêje: “Diçim Medîneyê ba Pêxember û êdî nayêm.” Li wê derê jî 7 salan dimêne, xelkê Erzîrûm û Mûşê xizmeta wî dikin û wî li wir rehmet kir, niha li wê derê di navbera gorên Cennetu’l-baqî medfûn e. (Notên li gel Mele Telhe).

Ku di sala 1980yî de înkilaba Evren diqewime, sirgûna Mele Telhe derdikeve. Li ser vê yekê ew jî îstîfa dike û diçe Libyayê û salekê li wê derê dimêne. Peyra vedigere û li Salorîkê (Dilimli) bi awayê fermî dest bi wezîfeya xwe ya îmamîyê dike. Piştî çendakî careke din ji îmamîyê îstîfa dike û dîsa diçe Libyayê. Li wê derê 2 salan bi tercumantî di şirketekê da dixebite. Şaxekî vê şirketê ehlê Iraqê; şaxê din ehlê Tirkîyeyê bûye. Rojekê karsazê şirketê jê dipirse: “Çima naçî îznê?” Ew dîyar kir ku meqseda wî ew e ku biçê hecê. Lewra ew jî pê ra alîkarî dikin û diçe hecê. Li wê derê li herêma hecê, sê mehan dimêne û ji ber ku gundîyên wî yên Salorîkê pir pê da dikevin ku were gundê wan, ew jî vedigere welatê xwe Salorîkê.

Gundê wan Kurdmeydanî ku 200 xanî bû, di zemanê rûdanên salên 1993yan da hatibû şewitandin. Ew bi tevî zar û zêçên xwe ketibûn ser rêya koçerî û xerîbîyê. Ew wekî penaber çûbûn Mêrsînê û 10 salan li wê derê mabûn. Ji wê derê vegeyabûn welatê xwe û di gel hin zehmetîyên fermî jî, wan bi pêşewatîya Mele Telhe heqê xwe bi dest xistibû ku gundê xwe ava bikin. M. T. Şerefkî di sala 1997an de malnişîn bûye, doza avakirina gundê xwe bi rêya fermî kirîye û di pey têkoşîneke dûr û dirêj a hiqûqî da mafê xwe di mehkemeyê da qezenc kirîye û pê gundê xwe ji nû ve ava kirîye. Wî bi qasî 19 salan xizmeta fermî kirîye. Di nav pêvajoya van salan da wî berhemên xwe jî nivîsîne.

2. Tesewufa Wî

M. Telheyê Şerefkî ji terîqetên herêma xwe mensûbê Terîqeta Neqşebendî ye. Ji ber meşxûliyeta ilmê medreseyê, wî zeman nedîtîye ku xizmetên tesewufî pêk biêne. Wî li cem Mele Ebdussemedê Ferhendê ku ji Şêx Ebdulhekîm xelîfetî standibûye, feqîtî kirîye. Xelkê wî li gel feqîyên wî dikevin xetmeyê; lêbelê Mele Telhe nakevê. Gava Seydayê wî jê dipirse: “Gelo çima nakevî xetmeyê?”, ew dibêje ku: “Seyda, bavê min gotîye divê tu herî bixwênî.” Êdî ew jî dibêje: “Temam, metnê xwe ezber bike.” Wextê ku Mele Mûsayê Medreseya Cimika di sala 1967an da îcaze didê, ji Mele Telheyî ra dibêje “Kurê min, tu şêxtîyê li xwe nexî bela, tu meletîyê bikî.” Ew jî dibêje: “Temam.” Mele Mûsa dibêje: “Ez jî xelîfe me, şêxtî nakim.” Li ser van rûdanan M. Telhe bi kar û barên tesewifê ra mijûl nebûye.

3. Kesayetîya Wî ya Edebî û Cihê Wî di Nerîtên Edebî da

M. T. Şerefkî, zemanê ku hîn zarok bûye, bavê wî li cem Şêx Xalidê Zengokî dixwend. Vî şêxî bi awayê menzûm hin berhem bi Kurdîya Kurmancî nivîsîbûn û bavê Mele Telhe ew ji zarokên xwe ra dixwendin. Malbata wan gişt li malê dicivîyan, bavê wan ew beyt dixwendin û xelkê malê qîz, jin, bûk û zarokan tevan lê guhdarî dikir. Çawa ku her kesê malbatê pê kêfxweş dibû, Mele Telhe jî hîn wê hingê di biçûkatîya xwe da pê kêfxweş dibû û hinek ji wan beytên Şêx Xalidê Zengokî jiber kiribû:

Çi wexta ji we yek cenabet ku bû

Bi lez ferz e avê li xwe ke zû

Eger ku ew bikaribe avê li xwe ke

Ku keslan bibe ew guhdarî neke

Dibe fasiq û facir û gunehkar

Ew ê kerê şeytan li wî bibe siwar

Şerefkî hîn ji biçûkatîya xwe ve bi çanda edebîyatê hisiyabû, îca ku derdikeve tehsîla medreseyan, di destê mela û feqîyan da şî'rên Cegerxwîn, ên Xanî û Cizîrî jî dibîne, tesîra wan jî li ser wî çê dibe. Ji edîbên edebîyata Tirkî Yunus Emre jî bala wî dikişêne û ew helbestên wî jî dixwêne. Lêbelê tesîra herî zêde, şert û derdên dinyayê li serê xuya dibin. Çinku ew rastî derbeya eskerî ya Evren dihê û rûdanên dîrokî yên mîna Gelîyê Zîlan, Mala Berzanî, Mereş, Dêrsim, Xerpût û Bidlîsê ji pirtûkên dîrokê dixwêne û dikeve bin bandora wan. Lewra ew bi vê helwestê dest bi hûnandina helbestên xwe dike. Ew li ser derdên xwe yên rojane, rûdanên şexsî, malbatî, qewmî, rûdanên dîrokî û giregir û pêşîyên Kurdan dinivîse. Ew van rûdanên ha, li ser bingeha çanda edebî ya bavê xwe û Şêx Xalidê Zengokî, hîn di wextê feqîtiya xwe da derbasî helbestê dike û di serdema meletîya xwe da jî bi pêş ve dibe. Di serdema meletîya wî da gundê wan û yên derdor ku tên şewitandin, rûdanên dilşewat li welêt diqewimin û ev gişt zor didinê ku bi rêya helbestê derdê dilê xwe hinekî hêdî û hênîk bike. Ew hem li ser derdê dilê xwe, hem jî li ser derdê dilê der û cîranên xwe helbestan dihûne. Bi vî awayî heta jê tê, roj di rojê da kîjan ji çîna civakê ku tûşî mexdûrîyetekê bihê, ew wan bi awa û ziman helwestek “rastbêjî” dike helbest û wan hiltîne. Ji ber vê rastbêjiya xwe, wî mexlesa “Rastgo” ji xwe ra hîlbijartîye. Wî di her wextî da, li

pêşberî her cure kesî “rastî” gotîye. Wî piranîya şî‘rên xwe bi rêya fotokopîyê li welat û derveyî welat belav kirine.

M. T. Şerefkî bi devê xwe dibêje ku ew xwe mensûbê ‘eqîdeya îslamê û hiqûqa îslamê dibîne. Giringî bi heq û hizra her kesî dide û ji wan ra hurmetkar e. Bi dîtina wî Xwedê teala mexlûqên xwe hurr çê afirandine û her kes di bîr û raya xwe da azad e. Lewra divê kes rê li ber kesî negire. Wekî vê ew qîmeteke mezin dide zimanê xwe û dixwaze bi zimanê xwe her tiştî bibêje û binivîse. Bi ser da jî ew xwe wekî kedkarekî zimanê xwe dibîne û qewîtîya zimanê xwe li milletê xwe dike. Bi dîtina wî rêya Qur’anê ji bo aramî û kamiranîya mirovahîyê rêya herî rast e, lewra gava mirov li Qur’anê guhdarî bike, dê her cure problemên xwe çareser bike:

...

Qur’an daynin ser masê ye

Ji wê bikin hûn pirsê ye

Hûn guh nedin tu yasê ye

Bibin paqij ji pasê ye

...

Bi qenaeta wî gava mirov bi hikmê Qur’anê ‘emel bike, tecawizî heqqê kesî nake. Heke ne wisa be, dê zerar bike. Çinku ew mirovên ku li heq û hiqûqê guhdarî nakin, wan dinya xelas kir, rût û tazî kir. Şerefkî ji menfieta xwe ya şexsî zêdetir giringî dide maf û azadîyên hemû mirovan û di vê rêyê da dixebite: Ew dibêje:

Rastgo zana bi Qur’anê

Mucahidê li cîhanê

Tim dibêje bi wijdanê

Wê xelas ke dîn îmanê

...

Ji bilî vê Şerefkî, dildar û dilsozekî qewî yê pêxemberê îslamê Cenabê Muhammed e û li serê bi vî awayî şî‘reke xwe dihûne:

Ez hatim te bibînim
 Te Muhemmed dihebînim
 Ez ji dil jî bi birîn im
 Şev û roja ez bi şîn im
 ...

Ew wê “peyman”a ku Cenabê Muhemmed Pêxember li Medîneyê bi xelkê ra çêkiribû, pir berz û bala dibîne û pir dildarekî dilsoz ê wê peymanê ye. Ew qelem û nivîsê, di rêya heq û edaletê de li ser giringîpêdana Xwedê teala zaf mezin dibîne û dibêje ku qelem her tiştî safî dike, heqqê kesî bi kesî ra bernade:

Ji bo heq û ‘edaletê
 Xweda çê kir boy miletê
 Ew dixebite her wextê
 Heta roja qîyametê
 ...

Ew hezkirîyekî mezin ê sê Muhemmedan e: Muhemmedê kurê ‘Ebdullah eleyhîssalam, Muhemmedê kurê Îdrîs Şafî û Muhemmedê Neqşebendî. Di pey van da ji du Seîdan hez dike: Seîdê Palewî û Seîdê Norsî. Ji du ‘Ebdullahan jî hez dike: ‘Ebdullahê Timoqî û ‘Ebdullahê Bulanixî. Du Selahedîn li ber dilê wî şîrîn in: Selahedînê Eyûbî û Selahedînê Amedî. Herwiha di edebîyatê da ji Mele Ebdurrehmanê Mûşî (Durre)³³ hez dike. Bi gotina Şerefkî ev edîb, hem Xwedênas in, hem jî xwenas in. M. T. Şerefkî dema ku di medreseyê de tehsîla xwe dike, rastî hin beytên Mele Şêxmûs (Cegerxwîn) dihê û kêfa wî jê re tê. Ji wê bi şûn da dikeve bin tesîra wî.

³³ **Mele Ebdurrehman Durre**, di sala 1930yî da li gundê Kêranlixa girêdayî Melazgirê hatiye dinyayê. Wî îcazeya xwe ji Medreseya Norşênê girtîye û nêzî deh salan melatî kirîye, peyra di Medreseya Hesên Paşa da mideristî kirîye. Ew di sala 1962yan da bûye miftî. Wî di salên 1980 û 1983yan da li Trablûsê tercûmanî kirîye, di salên 1990î da li Mûşê ketîye girtîgehê. Piştî ku wî çendakî li Stenbolê di Navenda Çanda Mezopotamyayê da dersên Kurdî daye, derbasî Ewrûpayê bûye. Ew di sala 2012an da li Kolna Almanyayê çûye ser heqîya xwe. Berhemên wî yên bi Kurdî ev in: *Evîna Welat* (1992), *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî: Felsefe û Jiyana Wî* (2002) û *Kurdname* (2006). (Bnr. <https://www.bernamegeh.org/jiyana-abdurrahman-durre/>, Tarîxa xwepêgihandinê: 20.05.2024, 17:37).

Mele Telhe, Şêx Xalidê Zengokî ku berhemên ‘eqîdeya îmanê nivîsîne, di pêvajoya perwerdeya xwe da ji nêz ve nas dike û ji berhemên wî îstifade dike. Zengokî, ‘*Eqîdetu’l-Kubra*, ‘*Eqîdetu’s-Suxra* bi Kurdîya Kurmancî nivîsîne û Mele Telhe ji wan mifa werdigire. Wekî din Zengokî *Kenzu’r-Rehme* û *Ferdu’l-‘Eyna Seyda* jî dîtîye. Hema hema hemû berhemên wî menzûm in û zimanê wan Kurdîya Kurmancî ye.

4. Berhemên Mele Telheyê Şerefkî

Mele Telhe bi zimanê Erebbî, Tirkî û Kurdî berhemên curbicur nivîsîne. Piranîya wan menzûm in; bes ên pexşan jî hene. Du dîwan, mewlûdek, bîyografîyek û otobîyografiyeke wî bi Kurmancî; çend helbest jî bi zimanê Tirkî û Erebbî hene.

4.1. Dîwana Gotinên Rast

M. Telheyê Şerefkî li ser rûpelê destpêka dîwana xwe wiha nivîsîye: *Kitaba Dîwana Gotinên Rast*. Şairî, ev helbestên xwe li ser kaxitên spî yê bexêz nivîsîne. Wî helbesta xwe ya ewil di sala 1961ê de nivîsîye û dîwana xwe di sala 2008an da qedandîye. Hejmara rûpelên dîwanê 90 e; hejmara helbestên vê dîwanê 32 ye. Helbesta ewil bi zimanê Erebbî ye; yê din bi Kurmancî ne. Şairî bi xetta qelema xwe nivîsîye. Wî hinek jê bi qelema ku hibra wê reş e nivîsîne, hinekan jî bi qelema ku hibra wê şîn e. Helbestên wî bi giştî bi terzê murebbe‘an³⁴ in; bes yê bi cureyê mesnewî û xezelan jî tê da hene. Rûdanên curbicur ên civakî bûne temaya wan. Helbesta wî ya ewil wiha dest pê dike:

Eman Rebbî birîndar im
Li ber derban pur xedar im
Ji ber îşan kûr dinalim
Kederlî me eman îro

Meraqlî me ji ber derdan
Destê mi jî di nav qeydan

³⁴ Murebbe‘, ew cure menzûme ne ku yekeya wan bend e. Hemû bendên wan ji çar misreyan pêk dihên. Şair, helbesta xwe bi heman kêşê, bi awayekî pîrserwayî dihûne. Di Kurdî da zanyarên edebîyatê ji bo vî cureyê helbestê “çarîne” dibêjin. Bi giştî du şeweyên wê yê serwayî hene: 1. aaaa, cccb, dddb; 2. aaaa, bbba, ccca. (Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, İstanbul, 2019, r. 371.)

Umûda min Rebbê ‘ebdan

Kederlî me eman îro

...

Ez gotox leqeb şehîr im

Pur heqîr û zehf esîr im

Ji guneha mustexfer im

Kederlî me eman îro

4.2. Dîwana Helbestên Şîrîn

Şairî, ev helbestên xwe gişt bi Kurmancî nivîsîne. 208 helbest tê da hene. Ev dîwan bi giştî 393 rûpel e. Wî ev bi qelesa ku hibra wê reş e nivîsîne û navê wê jî wiha danîye: *Kitaba Helbestê Şîrîn û Dîwana Helbestê Şîrîn*. Piranîya helbestên wî bi terzê murebbe‘an in.

Gazî dikim bo yekîtî

Kurdê hişyar ê raketî

Ji bo kurdî bo milletî

Yek bin di her memleketî

Memleketê li cîhanê

Nîn e ji me ra boy seyranê

Şêr û lehengê me kanê

Duşmin me bir ber talanê

Talan kirin her çar perça

Wekî gura wekî hirça

Xwarin Kurda tevî pirça

Kurd vûn xweyî seray burca

Burcê Kurda wan hatin xwar

Kurd hiştin bê cî û war

Wan duşminê çarê neyar

Xudê wan jî neke star

...

4.3. Heyat û Şîret û Kerametên Seydayê Hecî Xalidê Zengokî Kurrê Badik

Mele Telhe ev xebata xwe bi terzê pexşan, li ser kaxitê deftereke bêxêz, bi alfabeya Erebi-Kurdî nivîsiye. Hejmara rûpelên wê 29 e. Tê da behsa jîyan û berhemên wî yên bi navê *Mesailu'd-Dînîyye (mewzûn-winda)*, *'Eqîdetu'l-Îman el-Kubra (Kurmancî)*, *Murşidu't-Talibîn (Kurmancî, mewzûn e)*, *'Eqîdetu'l-Îman es-Suxra (Kurmancî, mewzûn)*, *Rewdet'ur-Reyahîn (Kurmancî, mewzûn)*, *Hidayetu's-Salikîn (Kurmancî, mewzûn)*, *Ferdu'l-'Eyn (Kurmancî, pexşan, fiqih) û Kenzu'r-Rehme (Kurmancî, mewzûn) dike.*³⁵ Beşeke wê wiha ye:

“Seydaê Şêx Hacî Xalid Zengokî Badikî, bi terîqeta xwe Neqşebendî ye, lê ew jî welîkî ji ewliyaê Kurdistanê ye. Bi bihîstina min Seydaê Hacî Xalid di sala 1879 miladî da hatîye dunyaê, kurê Şêx Mele Ebdullah e, ew jî kurê Şêx Mele Huseyn e. Divên koka wan seyyîd e. Seydaê Şêx Hacî Xalid di sala 1967ê miladî da çûye Medîna Munewwere, di sala 1973yê miladî da li Medîna Munewwere da wefat kirîye, di Cennetu'l-Baqî da di ara Hezreti Usman û Helîma Sadîye da defîn bûye.”³⁶

4.4. Mewlûda Nebî

Ev berhem, wekî destnivîs li ber destê me mewcûd e û 321 malik e. Bi tevî destpêk û diayê, hejmara rûpelên wê 63 ye. Miellif ew bi xetta destê xwe, bi qelesa xwe li ser deftereke bixêz nivîsiye. Di rûpelekî de şeş malikan cih girtîye. Wî ev menzûmeya xwe hem bi alfabeya Erebi-Kurdî hem jî bi ya Latîni-Kurdî nivîsiye. Diaya mewlûdê bi Kurmancî tê da heye. Herwiha wî di nivê din ê defterê da bi alfabeya latîn jî metna Mewlûdê nivîsiye. Destpêka wê wiha ye:

³⁵ Hevdîtina taybet li Dîyarbekirê: 18.12.2023. Wekî din *Risale di Heqqê Şêx û Mirîdan de* heye ku ew jî mewzûn e Kurmancî ye. Li ber destê Mela Wezîrê Hevêdî (Pasûrî) heye. *Kitaba Selewata Şerîf*, mewzûn û Kurmancî ye.

³⁶ Mele Telhe, *Heyata Seydaê Hecî Xalid*, (destnivîs), r. 5.

Hemdê pur ji bo Xudayê alemê
Ew Xudayê tim jî dike keremê

Ew e Rebbî ku wî me jî çêkirîye
Ab û hewa nûra zelal ji herî

Hûn jî hemdê bikin jê ra ey bira
Bo wî daye xatemê pêxembera

...

Malikên wê yên dawî bi vî awayî ne:

...

Ya Semî' û ya Xaliqê mexqlûqat
Ya Sebar û ya Mucîbê de'ewat

Bo Muhemmed al û eshabê di wî
Bo ruhê etba û ehbabê di wî

Bo ruhê Telhe muellif Şerefkî
Ew e Seydaê Rastgo ye Badikî

Hûn bixwûnin Fatîhe bo van tamam
Ser Muhemmed esselatu wesselam

...

Di dawîya duaya wê da tarîxa qedandîna wê wiha ye:

“Bi qelesa Seydaê Rastgo (Mele Telhe Şerefkî Badikî) 11 Cemazîyel ewwel 1437
hicrî; 20.02.2016 miladî yewmu's-sebt.”

Di pey van risteyan da wî bêjeya “not” danîye û li berê wiha nivîsîye: “Di vê *Mewlûda* min da hinek hevokê Ertûşî³⁷ û hinek hevokê Heyderî³⁸ hene. Xwedê rehma xwe li wan ke. Amîn. Lê ferq ew e hevokê axaftinê min bi Kurmancîya zelal e û terefkî *Mewlûda* min bi herfê latînî ye.”

4.5. Heyata Seydayê Rastgo

Şairî li ser bergê destpêka wê wiha nivîsîye: *Kitaba Heyata Seydaê Rasgo Mele Telheyê Şerefkî Badikî Kurdmeydanî Mûşî Şafi’î Neqşebendî*. Wî li ser tu rûpelekî tarîxa nivîsînê dîyar nekirîye. Ev berhem, wekî destnivîsa bi herfên alfabeya Kurdî-Erebî li ber destê me mewcûd e. Terzê wê yê nezmî, mesnewî ye û bi giştî 679 malik e. Mirov dikare wekî otobîyografîyeke menzûm bi nav bike.³⁹ Hejmara rûpelên wê 58 e. Miellif ew bi xetta destê xwe, bi qelesa xwe, li ser deftereke bêxêz nivîsîye. Hejmara malikên her rûpelekî, di navbera 10 û 14an de ye. Nivîskarî li dawîya vê berhemê, tarîxa qedandina wê nenivîsîye. Destpêka wê wiha ye:

Hezar û neh sed û çil û heft
Hatim dinyaê ez wî weqt

Hezar û neh sed û pêncî
Nufûsa Mûş ra ez xwecî

Weqta umrê min bûye şêst
Ketime gundê çîya û deşt

Min xwende Qur’an û kitab
Wek kesê bêda û bêbab

Cem Mele Yasîn Emîn

³⁷ Mebest jî Ertûşî, Mela Huseynê Bateyî ye.

³⁸ Mele Mihemed Emîn Heyderî, edîb û alimekî navdar e û wî li gel mewlûdê, çend berhem bi Kurdîya Kurmancî nivîsîne. Li jêrê behsa wî dê bihê kirin.

³⁹ Berî Mele Telhe di dîroka edebîyata Kurmancî da kesî “otobîyografîyeke menzûm” nivîsîye yan na, cihê mereqê ye.

Ew zû çû toprax û zemîn

...

Şerefkî ev menzûmeya xwe bi van malikan qedandîye:

...

Îmdada me her Xuda ye

Van torin û van geda ye

Xuda me tev serfiraz kî

Me ji ezabê xwe xelas kî

Heyata me pur û hindik

Me nivîsî sozê rindik

4.6. Nûbihara Kurdî

Nivîskar, li pêşberî bêjeyên erebî, bêjeyên Tirkî û Kurmancî nivîsîne. Wî bêje li ser kaxitekî bixêz nivîsîne. Hejmara rûpelên wê 29 e. Tarîxa qedandina wê 02.08.2009 e. Nivîskarî bi çend beytên Erebi dest pê kirîye û peyra êdî tenê bêje û wateyên wan hene. Wî hêmanên ahengê li ber çavan negirtine:

Zewc û recul erkek mêr

Mer'ete zewcete nisa kadın-jin

Walid baba-bav; walide anne-da

Şeqîq û ex kardeş-bira îbn oğlan-kur

...

4.7. Helbestên Tirkî

Şerefkî ji salên 1960î ve dest bi hûnandina helbestên Tirkî kirîye. Ew di sala 1960î da ku wê hingê 11-12 salî ye nexweş ketîye, bavê wî ew birîye Îsparta Egrîdîr Kemik Hastanesi,

li wê derê ku sê mehan tedawî dibîne û li malê jî 2 salan di nav cih û nivînan da dimîne, wê hingê ev helbest nivîsîye:

Kemiği kesince beynim bulandı
 Gözlerim karardı başım dolandı
 Ateş düştü içime ciğerim yandı
 Kara bayram yana yana kül oldu.

Ameliyat bitince getirdiler sedyeye
 Zehirli hapları doldurdu mideye
 Akan kanlarım felek için hediye
 Yine bulamadım derdime çare
 ...

Di sala 1980yî da ji ber derbeya eskerî ya K. Evren sirgûna wî tê îlankirin. Li ser vê ew jî îstîfa dike û diçe Libyayê, bi qasî salekê li wê derê dimîne. Peyra vedigere welat careke din dest bi wezîfeya xwe ya îmamîyê dike. Peyra careke din diçe Libyayê û li wê derê 2 salan bi tercumanî di şirketekê da dixebite. Wê hingê wî ev helbest hûnaye:

Afrika Şirketi
 Sensin uluslararası gezen Biztaş
 Fakire getiren çat yerinde kumaş
 Kim senedi bozarsa olur rezil u fahş
 Seni ayakta tutan iyi niyet el u baş

Senin sümbülün çizilmedi hiç belaş
 İşaret ediyor o beş büyük kardaş
 Mezopotamyalıdır bir ferdi keleş
 Kalan dördü Türktür bila emsal eş
 ...

Helbesteke wî ya din jî heye ku ji hêla cureyê xwe ve “ne‘t” e û li ser hezkirina Cenabê Pêxember e. Destpêka wê wiha ye:

Arap yarım cezirinde
 Abdulmuttalib neslinde
 Sevinç oldu hepimizde
 Muhammed’i çok severiz
 Sevinç daim olsun bizde
 Abdullah baba ölümde
 Amine anne doğumda
 Muhammed’i çok severiz
 Anne beş yüz yetmiş birde
 Mekke şehrin iyi yerde
 Doğum etti asilzade
 Muhammed’i çok severiz
 ...

4.8. Helbestên Erebi

M. T. Şerefkî, di nav helbestên pêşî yê *Dîwana Gotinên Rast* da cih daye helbesteke Erebi. Mirov ji ber temaya wê, dikare vê helbestê wekî helbesteke munacatî qebûl bike. Helbesta wî ya ku di rêza duyem da ye û bi zimanê Erebi ye wiha ye:

Ehmedekellahu’l-besîra
 Estexîsek ya muyessera
 İnnî mufessiru’l-esîra
 Fe eqrebna ‘inde’l-qusûra
 İlahî ente’l-qedîra
 İnnenî eşşexsu’l-heqîra
 Beqîyet ceddî pîra
 Feeqrebuna ‘inde’l-qusûra
 İneha elummu’l-kebîra

Ma leha'l-xetew'l-cedîra

...

We huwe "Telhetu'ş-şehîra"

Feeqrebna 'inde'l-qusûra

Mewlaye ente'l-cedîra

Kullu hemdin xeniyyun we feqîra

Selli 'el'l-beşîru we'n-nezîra

Feeqrebna 'inde'l-qusûra

...

5. Analîza Dane û Vedîtinan

Di pey xwendina lîtaraturê û komkirina daneyên pêwîst da êdî em dikarin vedîtinên ber destê xwe yê ve vekolîne analîz bikin. Lewra ji vir pê ve em dê hewl bidin dîyar bikin bê ka karîgerîya kîjan edîban li ser Şerefkî çêbûye, teşe û cureyên edebî yê berhemên wî çi ne û wî di kîjan medreseyan da li kê derê li ber destê kîjan miderisî tehsîla xwe birîye serî.

5.1. Karîgerîya Edîbên li ser Şerefkî

Mele Telheyê Şerefkî ku edîbekî nivê dawî ye sedsala 20î ye, gihaştîye nîfşê nivê ewil ê sedsala 20î û ji tecrubeyên wan ên dînî û edebî mifa wergirtîye. Ew ji aliyê mefkûreya dînî ve di bin karîgerîya Yunus Emre, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Mele Mihemed Emîn Heyderî û Şêx Xalidê Zengokî⁴⁰ da maye; ji hêla hezkirina welat û gelê xwe ve ketîye bin karîgerîya şairên welatperwer ên mîna Mele Şêxmûs (Cegerxwîn) û Mele

⁴⁰ **Mele Xalidê Zengokî**, di sala 1895-1900an da li Zengoka (Tr. Yörecik) Mûşê hatîye dinyayê. Ew kurê Şêx Mele Ebdullah e û zavayê Şêx 'Elî ye. Şêx 'Elî di zemanê xwe da muftîyê Mûşê bûye. Mele Xalid piraniya perwerdeya xwe li ba Mele Yûsufê Kodê ku miderisekî navdar ê Mûşê bûye dîtîye, wekî din wî li cem Mela Silêmanê Kerran ên Mala Başo (Tr. Karaorman) ya Qulpê xwendîye. M. X. Zengokî, di zemanê xwe da li gundên derdora Mûşê gelek mizgeft dane avakirin û hin caran jî mideristî kirîye. Wî bi navê *Ferzu'l-Eyn, Menzûmetu'l-Eqaid û Murşidu't-Talibîn* çend berhemên eqîdeyî-dînî-fiqhî bi Kurmancî nivîsîne. Mele Xalid beşdarî rûdana Şêx Seîdî bûye û hatîye girtin. Ew piştî ku ji îdamê xelas dibe, diçe Medîneyê û di sala 1973yan da li wê derê wefat dîke. (Edîb Tewerzî, "Seydayê Mele Xalidê Zengokî û Berhema Wî ya Murşid't-Talibîn", *Nûbihar*, 2009, j. 107, r. 33-34.; Mele Telheyê Şerefkî, *Heyata Hacî Xalidê Zengokî*, r. 5.); Recep Aslan, "Molla Hâlid Zengokî ve İlmî Kişiliği", *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Uluslararası Sempozyumu*, Muş Alpaslan Üniversitesi, Nuş, 2012, r. 731.

Ebdurrehmanê Mûşî (Durre). Li alîyê din çawa ku wî bi xwe jî amaje pê kirîye, wî di hûnandina mewlûdê da daye ser çexera Melayê Bateyî (Ertûşî) û Şêx Mihemed Emîn Heyderî.⁴¹ Lewra ji seyra berhemên wî wisa xuya dibe ku wî ji hêla nerîta edebîyata Kurmancî ya dînî ve daye ser şopa Melayê Bateyî, Şêx Xalidê Zengokî û Şêx Mihemed Emînê Heyderî; ji hêla nerîta edebîyata Kurmancî ya qonaxa dîrokî ve daye ser şopa Mele Şêxmûs û Ebdurrehman Durre. Wekî mînak ji *Dîwana Helbestên Şîrîn*:

Gazî dikim bo yekîti
Kurdê hişyar ê raketî
Ji bo Kurdî bo milletî
Yek bin di her memleketî

Memleketê li cîhanê
Nîn e ji me ra boy seyranê
Şêr û lehengê me kanê
Duşmîn me bir ber talanê

Navê berhemê	Karîgerîya edîban	Mijar
Mewlûd	1. Mela Huseynê Bateyî 2. Şêx Xalidê Zengokî 3. Mela Mihemed Emîn Heyderî	Dînî

⁴¹ **Mele Mihemed Emîn Heyderî**, di sala 1927an da li gundê Kelehê (Kalecik) ku li ser Nisêbînê ye hatîye dinyayê. Ew kurê Mela Ahmed Heyderî (1887-1937) ye. Ew ji eşîra Asî ya herêma Patnos, Ercîş û Dedelîyê ye. M. M. Heyderî di 10 salîya imrê xwe da ji bo tehsîla îlim koçî Qamişloya Sûriyeyê kirîye û li gundê Girbawîyê li cem Şêx Ebdulletîf Dalînî dest bi tehsîla îlim kirîye. Peyra ew çûye ba Şêx Ahmed Xeznewî û wî tehsîla xwe ya tesewuf û medreseyê qedandîye. Wî di sala 1947an da ji Mela Ebdurrezzaq Helêlî îcazeya xwe girtîye; di sala 1967an da jî ji Şêx Eledîn el-Xeznewî îcazeya tesewufê girtîye. Peyra ew ji wê derê vegeyîyaye hatîye gundê Kelehê û wî li gundê Tîmata (Kutlubey) Midyadê îmamî kirîye. Wî hem hin qesîde li ser Şêx Eledîn hûnane hem jî bi navê *‘Eqîdeya Îmanê* (Kurmancî), *Mewlûd* (Kurmancî), *Werdu’l-Ûfal* (Kurmancî), *Mewlûd* (Erebî), *Munacat* (Kurmancî) û *Dîwanek* (Kurmancî) berhem nivîsîne. M. M. Heyderî di sala 2003yan da wefat kirîye û di hewşa Kullîyeye xwe ya ku li ser rêya Dîyarbekir-Farqînê da medfûn e. (eş-Şeyx Muhemmed Emîn el-Heyderî, *Tuhfetü’l-Heyderî*, Mektebetu Seyda, Dîyarbekir, 2019, r. 5-13.

Nûbihara Kurdî	Ehmedê Xanî	Zimanî
Heyata Rastgo	1. Ehmedê Xanî 2. Mele Şêxmûs 3. Ebdurrehman Durre	Neteweyî - Dînî
Dîwana Gotinên Rast	1. Ehmedê Xanî 2. Mele Şêxmûs 3. Ebdurrehman Durre	Neteweyî - Dînî

Tablo 1: Edîbên ku karîgerî li Şerefkî kirine.

Herçendî helbestên her du dîwanên wî bi giştî li ser mijarên gelperwerîyê bin jî, divê em dîyar bikin ku di her du dîwanan da jî gelek helbest hene ku mijar û temaya wan bi temamî dînî ne. Wekî mînak ji Dîwana Helbestên Şîrîn:

Selam dikim bi ruh û can
We hez dikim bo dîn îman
Tim Îslamê bikin jîyan
Boy axretê nebin pîşman

Qur'an daynin ser masê ye
Ji wê bikin hûn pirsê ye
Hûn guh nedin tu yasê ye
Bibin paqij ji pasê ye

...

5.2. Li gor Cure, Teşeyê û Ziman Berhemên Şerefkî

Berhemek ne tê da hemû berhemên Şerefkî bi teşeyê menzûm in û cureyên wan ên edebî bi giştî mesnewî, xezel û murebbe' in. Çend helbestên Tirkî û Erebî li alîyekî, hema hema zimanê hemû berhemên wî Kurmancî ye.

Navê berhemê	Teşeyê berhemê	Zimanê berhemê
Mewlûd	Menzûm	Kurmancî

	(Mesnewî)	
Heyata Şêx Xalidê Zengokî	Pexşan	Kurmancî
Heyata Rastgo	Menzûm (Mesnewî)	Kurmancî
Dîwana Helbestên Şîrîn	Murebbe‘	Kurmancî & Tirkî
Dîwana Gotinên Rast	Murebbe‘, Xezel, Mesnewî	Kurmancî & Erebî
Nûbihara Kurdî	Pexşan	Erebî-Kurmancî- Tirkî

Tablo 2: Li gor teşe û ziman berhemên li Şerefkî

Çawa ku ji tabloya jorîn xuya dibe Şerefkî, piraniya berhemên xwe bi Kurmancî nivîsîne û bi piranî temaya wan dînî, civakî û edebî ne.

5.3. Navê mideris û medreseyan ku Şerefkî li cem wan xwendîye

Navê Mideris	Navê Medreseyê	Navê Herêmê
1. Mele Yasîne Aqîka	Medreseya Kurdmeydanîyê	Kurdmeydanîya Mûşê
2. Mele Yasîne Aqîka	Medreseya Qizilaxacê	Qizilaxaca Mûşê
3. Mele Remezanê Aqîkî	Medreseya Kovîtê	Farqîn
4. Mele Fethullah	Medreseya Pelkê	Bekirhan/Kozluk/Batman
5. Mele Huseyn Küçük	Medreseya Mala Ezîzan	Navenda Farqînê
6. Mele Hadî	Medreseya Mala Ezîzan	Navenda Farqînê
7. Mele Mehdî	Medreseya Mala Ezîzan	Navenda Farqînê
8. Mele Mistefa	Medreseya Aşqale	Agirî/Ağrı
9. Mele Ebdussemedê	Medreseya Ferhendê	Farqînê

kurê Mele Yehya		
10. Mele Îbrahîmê Belê	Medreseya Artxungê	Mûş
11. Mele Ebdulhekîmê Kose	Medreseya Seqawîyê	Mûş
12. Seyda Şêx Seyîd	Medreseya Reşîkê	Farqîn
13. Mele Mûsayê Cimika	Medreseya Cimikan	Erxenî-Dîyarbekir
14. Mele Sidîq	Medreseya Axfirîs	Norşên-Gurpinar
15. Mele Ebdulkerîm	Medreseya Warqîlîs	Mûş

Tablo 3 Mideris û medreseyên Şerefkî

Çawa ku ji tabloya jorîn jî xuya dibe, M. T. Şerefkî li cem 15 miderisên navdar ên medreseyên herêma Serhed, Dîyarbekir û Batmanê tehsîla îlim kirîye.

Encam

Di destpêka vekolînê da me dîyar kiribû ku em dê li pey tesbîtkirina bîyografî, berhem û kesayetîya Mele Telheyê Şerefkî bigerin û piştî tesbîtkirina van alîyên wî, em dê hewl bidin ku cihê wî yê xweser di nav qonax û nerîtên dîrokî yên edebîyata Kurmancî da tesbît bikin. Bi vê armancê em derketin û qadê û bi mebesta ku em pirsgerêka vekolîna xwe çareser bikin û bersiva pirsên xwe bibînin, me hem ji devê edîbî bi xwe agahdarî kom kirin hem jî her yek berhemeke wî mitale kir. Ji dane û vedîtînen ku di pêvajoya vekolînê da me ew bi dest xistin dîyar bû ku Şerefkî, di pêvajoya tehsîl û perwerdeya xwe ya medreseyê da li herêmên mîna Serhed, Dîyarbekir û Batmanê, ji 15 alimên navdar ên serdema xwe ders wergirtiye. Ew alimekî edîb ê nivê dawî yê sedsala 20î ye û wî di warê edebîyatê da daye ser du şopên cîyawaz ên alimên edîb ên edebîyata Kurmancî. Wî ji hêla çexera edebîyata dînî ve daye ser şopa Cizîrî, Xanî, Bateyî, Zengokî û Heyderî, ji hêla çexera edebîyata neteweperwerî ve daye ser şopa Xanî, Cegerxwîn û Durre. Lewra ji hêla kesayetiyê ve du alîyên wî hene: Alîyê dînî-tesewufî û alîyê gelperwerî. Wî di piranîya helbestên dîwana xwe da rewşa civakî ya gelê xwe kirîye mijar.

Mele Telheyê Şerefkî, wekî şairekî herêma Pasûr û Mûşê, nûnerekî sedsala 20î yê edebîyata Kurdî ya Kurmancî, bi berhemên xwe dikare cihê xwe di nav nerît û qonaxên dîrokî yên edebîyata Kurdî ya Kurmancî da bigire. Heke vekoler li ser dîwan, menzûme û

mewlûda wî vekolînên akademîk bikin, dikarin hîn baştir kesayetîya wî ya edebî derxînin holê û cihê wî yê di dîroka edebîyata Kurmancî da zelaltir bikin.

Spasî

Ji ber ku di vê vekolînê da alîkarîya wan çêbû, dixwazim dîyar bikim mala Dr. Tekin Çiftçi, Dr. Yakup Aykaç, Mele Ebdulletîf Bakış û Eşref Bakış ava be. Helbet spas bo Mele Telheyê Şerefkî jî ku di her hevîtina rûbirû û hevpeyvîna bi rêya telefonê da gelek zêde alîkarî da min.

Çavkanî

- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk da*, İstanbul: Nûbihar.
- Ağcakaya, M. (2021). –<https://www.tigrishaber.com/video-silvanda-unluleri-yetistiren-koy-olarak-biliniyor-74533h.htm>. tigrishaber.com: <https://www.tigrishaber.com/video-silvanda-unluleri-yetistiren-koy-olarak-biliniyor-74533h.htm> adresinden alındı
- Aslan, E. (2023). Talha Yiğit (D. 1950). İ. Baz içinde, *Şark Uleması VI. Cilt* (s. 279). Ankara: İlahiyat.
- Aslan, R. (2012). Molla Halid Zengokî ve İlmî Kişiliği. F. G. (Edit.) içinde, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Uluslararası Sepozyum* (s. 740). Muş: Muş Alpaslan Üniversitesi.
- Çiçek, M. (2009). “Seyda Molla Hüseyin Küçük’ün Hayatı ve İlmî Kişiliği”, *Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, j. II.
- el-Ebbasî, Şeyh Yahya (2007). *Sohbet-i Gulşeni*, (Derleyen: Serdar Üstündağ), İstanbul: Sistem Matbaacılık.
- el-Heyderî, Ş. M. Emîn, (2019). *Tuhfetu’l-Heyderî*, Dîyarbekir: Mektebetu Seyda.
- Güneş, N. (2023). [mardinlife.com/yasam/badikan-asireti](https://www.mardinlife.com/yasam/badikan-asireti). mardinlife.com: https://www.mardinlife.com/yasam/badikan-asireti-nedir-badikan-asireti-lideri-kimdir-badikan-asireti-nerede-asiretin-kac-kolu-var#google_vignette
- Hêvîdar, M. Êhsan, (2008). “Seydayê Mela Yehyayê Ferhendî”, *Nûbihar*, j. 104.
- Tewerzî, E. (2009). “Seydayê Mele Xalidê Zengokî û Berhema Wî ya Murşid’t-Talibîn”, *Nûbihar*, j. 107.

Varli, M. Sadık, (2023). *Bi Dîtin û Şahidîya Min Ebdullah M. Varli*, İstanbul: Nûbihar.

Çavkanîyên Dijîtal

<https://pasurilcesi.blogspot.com/2009/03/pasur-ilcesi-koyleri.html>

<https://islamansiklopedisi.org.tr/erol-muhammed-rasid>


<https://redkani.blogspot.com/2017/06/asqe-le-askale.html>,

<https://www.google.com/maps/dir//38.1564969,39.9525739/@38.192864,39.7735905,10.96z?entry=ttu>)


<https://www.bernamegeh.org/jiyana-abdurrahman-durre/>

Taki Eren, “Şeyh Bahaddin”, <https://www.duderyadiyari.com/Makale/93/16>.


Pêvek




Fotoyê Helbesta Ewil a Dîwana Gotinên a Rast Mele Telheyê Şerefkî



Fotoyê Rûpelê dawî yê Mewlûda Mele Telheyê Şerefkî



Fotoyê Rûpelê ewil ê Mewlûda Mele Telheyê Şerefkî



Rûpelê ewil ê Heyata Seydayê Rastgo



Rûpelê ewil ê Dîwana Helbestên Şîrîn



Di nav melayan da yê bêşaşîk Mele Telheyê Şerefkî ye.